Zanyarî jibo kesên sûrî ên bê cinsî ên weke penaber li welatê Danîmark îqame stendine yanjî ên heta niha qezyên wan dibin çareserkirnê dene.

Heger tu xelkê Sûrî û mafê penaberî ji Danîmark dixwazî, gelekî girînge jibo çareserkirna qezya te bidî xwyakirin ku erê tu weke hevwelatyekî sûrî yanjî weke yekî bê cinsî hatî secilandin.

Ev tişt jibo çareserkirna daxwaza mafê penaberînî giringî tune, lê heger te îqame li Danîmark stend, ev tişt wê giringya wê hebe heger di paşerojêde zarokên te li Danîmark çêbûn.

Jibo ên bê cinsî ku li Danîmark ji dayîk dibin, firseta stendina cinsîya denîmarkî bi sênahî tire ji wan ên berê cinsîya sûrî hene.

Heger tu hatî secilandin weke hevwelatyek sûrî (tu dikarî wê bibînî diser kerta penaberînî/kerta sipîde), lê heger tu weke yekî bê cinsî xwe dihesibînî, divê tu peywendîyê bikî digel Dezgehê Xizmetkirina Bîyanyan/ofîsa penaberî û daxwaza guhertina evê zanyaryê bikey. Heger te hindek dokumênt hene ku ev tişt piştrast bikin ku tu yakî bê cinsî, gelekî girînge kopîyek bişînî jibo Dezgehê Xizmetkirina Bîyanyan.

Heger te neha weke penaber li welatê Danîmark îqame stendîye, dikarî ew zanyarîyên nerast ên hatine secilandin biguherî. Dikarî berê xwe bidî kerta îqama xwe dakû bizanî erê tu hatî secilandin weke hevwelatyek sûrî yanjî weke yekî bê cinsî.

Heger ev tişt li cem te ne xuyaye û eşkere, dikarî peywendî ligel me bikî li cem Rêkxrawa Denîmarkî jibo Alîkarya Bîyanyan di rojên dewamêde demjimêr 9 ta 15 bi telefona jimare 33 73 50 00.